Daîreya Koçberan

Mafê karkirinê yê penaxwazan

Wek penaxwaz tu dikarî kar bikî tenê eger te mafê karkirinê yê qanûnî hebe. Gava ku karekî peyda bikî, bipirse kar mafê te yê karkirinê dest pê kiriye û hê jî qanûnî heye.

Penaxwaz divê xwedîkarê xwe haydar bike eger mafê karkirina wî nemîne.

Di cih de xwedîkarê xwe hayda bike eger mafê karkirina te nemîne. Eger tu bêyî mafê karkirinê bixebitî, dikarin te ji ber sûc an tawanan ceza bikin.

Ji kû dikarî agahiyên li ser mafê karkirinê peyda bikî?

- Dema dawakirina mafê penaberiyê dê belavoka ”Agahî li ser mafê karkirinê” bidin te ku zanîn li ser destpêkirina mafê karkirinê tê de heye.
- Behsa nemana mafê karkirinê di biryarê de tÊ kirin. Di biryara erênî de behsa mafê karkirinê li ser bingehê îqameyê tê kirin.
- Ji malpera bi navnîşana migri.fi/turvapaikanhakijan-tyonteko-oikeus

Mafê karkirinê kengî dest pê dike?

Dikarî karê bi meaş bikî piştî sê yan şeş mehan ji dema dawakirina xwe ya mafê penaberiyê.

- Dem sê meh e eger te pasport an belgeyeke din ya seferkirinê ya eslî û qanûnî pêşkêş kiribe bo karmendan.
- Dem şeş meh eger te belgenameyeke seferkirinê ya wisa pêşkêş nekiribe.

Çi tesîra dawaya nû li ser mafê karkirinê heye?

Eger dawaya nû piştî 1.6.2019 bikî, divê ku tu dîsa sê yan şeş mehan bisekinî heta dîsa bikarî kar bikî. Mebest ji dawaya nû ew dawaya mafê penaberiyê ye ku penaxwaz dike piştî ku yek an zêdetir biryar li ser dawa xwe ya mafê penaberiyê wergirtibin.

- Dem sê meh e eger te pasport an belgeyeke din ya seferkirinê ya eslî û qanûnî pêşkêş kiribe bo karmendan.
- Dem şeş meh eger te belgenameyeke seferkirinê ya wisa pêşkêş nekiribe.

Eger te dawaya nû berî 1.6.2019 kiribe, tu dikarî yekser piştî dawakirinê dîsa kar bikî.

Heta kengî dikarî kar bikî?

Piştî wergirtina biryarê, divê piştrast bikî ya te hêjî mafê karkirinê heye. Ew di biryarê de tê behskirin.

Te biryareke erênî wergirt?

Eger tu biryareke erênî wergirî, di piraniya haletan de mafê te yê karkirinê li Fînlandayê didome. Dikarî ji karta îqameyê yan biryarê bibînî ka te mafê karkirinê Fînlandayê heye.

Te biryareke neyînî wergirt?

Eger biryar neyînî be, mafê te yê karkirinê wiha bi dawî dibe:

- eger te biryareke bikêrhatî bicihkirinê wergirtibe anku eger li gor qanûnê mafê derxistina te ji welat hebe berî 1.6.2019, mafê te yê karkirinê namîne gava ku biryar bikeve hukmê qanûnî.
- eger biryar bo bicihkirinê ne bikêrhatî bû berî 1.6.2019, mafê te yê karkirinê namîne gava ku biryar bikeve hukmê qanûnî. anku eger li gor qanûnê mafê derxistina te ji welat hebe. Behsa wê di biryara Daîreya Koçberan de tê kirin.

Kengî biryar dikeve hukmê qanûnî?

Biryar di van haletan de dikeve hukmê qanûnî:

- Eger biryar wergirtiye û di dema itirazkirinê anku 21 rojan de ji wergirtina biryarê itiraz li dadgeha îdarî nekiriye.
- Te biryara dadgeha îdarî wergirtiye û di dema itirazkirinê anku 14 rojan de itiraz nekiriye li dadgeha bilind ya îdarî.
- Te biryar li ser dawa mafê itirazkirinê û itiraza xwe ji dadgeha bilind ya îdarî wergirtiye.

Kengî biryar bo bicihkirinê bikêrhatî ye?

Gava ku biryar bo bicihkirinê bikêrhatî be, dikarin te ji welat derxin. Di biryarê tê gotin ku kengî ew bo bicihkirinê bikêrhatî ye.

Dikarî ji malperê bixwînî ku kengî dikarin te ji welat derxin.
Agahiyên zêdetir: migri.fi/kaannyttaminen

Erkê xwedîkar bo pişstrastbûn ji mafê karkirinê

Divê xwedîkar pişstrast bibe ku karkerê biyanî îqameya karkeran heye yan wek din ew ne hewceyî îqmaeya karkirinê ye.

Xwedîkar dikare bi sûc an tawanê bêt cezakirin eger ew bi qest yan ji terkexemî karkerekî wisa li cem xwe bişuxilîne ku mafê karkirinê nîne.

Xwedîkar dikare ji mafê karkirinê pişstrast bibe bi pirsîna ji karkerê xwe. Xwedîkar herwiha dikare dawa belgenameya mafê karkirinê ya penaxwazî bike. Şîret li ser malpera bi vê navnîşanê ne: migri.fi/todistuspyynnot